



2018 - The Year of ITI



Wêrwêr Laykîng

Nameya roja şano ya cîhanî 2018 - Afrîka - “ Ivory Coast “
Hunermendek cûr be cûr e.

Mirovek biryar dide ku li pêş mirêkê (temaşevan) ji xwe pirsê bike da
paşve bi xwe li hember heman mirêkê (temaşevanên xwe) bersivan
afirîne da xwe rexne bike û bi pirs û bersivên xwe bikene.

Da bikene yanjî bigrî herweha li dawiyê

Da xweşhatin yan jî pîroziyê li mirêka xwe (temaşevanên xw) bike.

Da vê kurte dema aram û rihet pêde.

Ewjî xwe xûz dike da rêzdarî û dilxweşiya xwe şanî bike

Di nava xwede ew li aştîyê digeriya

Aştîya bi xwer û bi mirêka xwere:

Wî şano dikir...

Wê rojê ew di axivî

Siza, pîvan û nebaşiyên xwe cewisandin

Matmayîna xwe diriya çavlêkirinê û dijberiyê de

Sextiya wî di kar û barên ne mirovane de di dan xuyakirin

Xapên wî ew malwêran kirin

Ew bi xwere di axivî...

Ji xwe razîbûna wî di pîlanên ber bi jor ve

Di nerînên zilhêzbûnê bo hebûneke baştir di cîhaneke paktir de

Ewê ramanên xwey taybet ava bike

Wî dikarîbû bi destên xwe ramanên ne rast peyda bike

Di navbera xwe û kesatiya xwe de, di mirêkê de wî ev yek dixwest, ji

xwere digot, heger wî û mirêka xwe viyan havpar kiribana...

Lê wî ev yek dizanî : wî lîstikvanî dikir hin aşop û hizrên ne rast, lê

herweha bi giştî wî karekî hişmendî ji bo avakirinê û kêfxweşiyê li cîhanê
dikir

wî Şano dikir ...

Ta di riya hêrfandina hêviyan de

Bi gotinên wî û telîpêvekîrin hizran ve

Wî bawerî bi vê yekê anîbû

Ku hertiş dê vê şevê bi riya stêrkên wî yên dîn re pêk were
 Bi riya gotinên wiyên şêrîn re
 Bi girmijîna wî ya bi êş re
 Bi pêkenîna wî ya şêrîn re
 Bi gotinên wî yên dilşewat re anku pêkanîna operasyoneke derhoz re.
 Erê wî Şano dikir.
 Bi giştî
 Li mal li Afrîka
 Bi taybetî di para Kamite¹ de (tirîkê gur) ya ku ez jê hatim, haya me ji
 tiştêkî tunebû
 Ta di şîniyan de di dema girî de jî em dikeniyar , me li zemînê dixist
 dema wê tiştên me pêk netanîn
 Di riya Gbégbé² yan Bikogutsi³ rûdanên bi tirs çêdikirin Glaé⁴, Wabele⁵
 yan poniugo⁶
 Ji bo naskirina pîrensîbên ku vegeer jê tune
 Yê ku karan û demê û lîstokên ku ji me hesdikin li ser me ferz dike
 Li dawiyê naskirina afirênderan
 Di riya bi karanîna yê ku bi wan dilîzin
 Berçavkirina karvedanan dema bi lêvkirina bêjeyan
 Li gel bihnkişabdinê û stranên bi ritim re bi hêz dibin
 Di çê hin dîlanên pîroz wek dîlankaran bi lebatên çeleng bi hostayî bi kar
 tîne.

- 1- kamite; danîştîwên Kamîta, xaka Reşan, ronahiya “Afrîka”.
 Kamît herweha hemî welatîyên ku nevyên wan li seranserî cîhanê li
 deveran belav bûne hevdem kesên Ola resen li vê deverê bi kartînin
 destnîşan dike
- 2- Gbégbé; dîlaneke kultûriye li bajarê Bétés Ivory Coast, ew di
 xwepêşadanên giştî de ji bo xweşiyar herweha ji bo şînê bi kar tê.
- 3- Bikoutsî; destlêdana xakê dîlaneke (Beti) ya resene li başûrî Kamîron
 li destpêkê ew ji hêla jinan ve tê bi karanîna tede xweziyên xwe ji Xaka
 Dayik dixwazin da çinîneke baş û giştûbayekî xweş û herwisa tiştên din jî
 bide wan, lewre pêwîste ew nigê xwe li xakêxe da guh bide banga hişê
 wan îro jî ciwanên ku bûne stêrk li cîhanê vê dîlanê vijîn dikin.
- 4- Glaé; Rêxistina oldarî bo herdû gelên Wé û Wobé yê rojavayî Ivory
 Coast ew têkildarî Mizgeftan dibin pileyên sêgoşî yê rûdanan bi giştî
 metirsîdarin ew lata yekem bo hemî rewîşt û rêxistinên civakî yê van
 gelan e.
- 5- Wabele; yek ji e s rêxistina olî ya Sînofo ye li bakurî Ivory Coast e, li
 gel serê keftar herweha agir û xwarinê ew simbolên zanîztî û
 desthilatdariyê ne.

6- poniugo; rûdanekî din yê rêxistina olî ya Sînufo ye, li gorî Poro destpêkirina bangewaziya di dilê daristanan de yên ku ji civaka wan re desthiladar e.

Lê herweha û berî hertiştî tiqtiqa ken bi germî tê hildan da şahiyê bi dilxweşiya jînê bikin
Êdî tu serdemên koletiyê bo stemkariyê,
Netwperistî û newekheviyê namînin.
Na ji bo mana malwêraniya fetisandin û jêstandinên ku nayên pesindan
Ji canê Bav ji Dayika Mirovayetiye, li Afrîka wek herderekê din li cîhanê
Em Şanoyê dikin.
Di vê sala taybet de ez pir kêfxweşim ku ITI ev derfet da Parzemîna
Afrîkayê da nameya Aştiyê hilgire.
Nameya Şano ya Aştiyê
Ji ber li vê parzemînê ji demeke ne dûr ve hatibû gotin ku hertişt li cîhanê
di be ku çêbibe bêyî ku kesek qerebalixekê bibhîze
Va careke din danpêdan bi rola wê ya sereke tê kirin.
Ji Bav û Dayikê bo Mirovayetiye
Û tevahiya cîhanê ku di vê çarçewê deye
Jiber herkes berdewam hêviya Aştiyê li ber sînga dê û bavê xwede dike,
ma ne wisaye?
Herweha Şanoya me bihtir ji her demê ronahiyê dide hevpariyê bi herkesî
re dike nemaze ew kesên hevpariya raman û gotin û karên Şanoyê dikin
pêwîste bihtir rêzdariya xwe û ya hev jî bigrin.
Di riya bi karanîna baştirîn rewîştên Mirovayetiye de
Bi hêviya vegera Mirovatiyeke baştir bo hemiyên.
Ew yek di kare jîrbûn û lihevkerinê peyda bike.
Di riya bi karanîna vî parçeyî ji çanda mirovan ku ew bihêztirîn tişte ku di
kare sînoran rake: Şano ye.
Ew dangeştirîn yeke ji ber ew bi hemî zimanan di axive hemî
şaristaniyan kom dike û dibe vedenga hemî rewîştên buha.
Û tevî hemî astengiyan ew hevgirtinek kûr ya mêran peyda dike ev mêr jî
derdê wan hevnasîneke bi rêk û pêke dema ku wek lîstivanan kar dikin
ew Aştiyê û aramiyê peyda dikin ji ber hêza ku Şano dide, dike ku herkes
bikene û qîja bide bi riya kêmkirina nezaniyên wan û bihêzkerin û
bilindkirina zanyariyan ta ku ew kes bibe xwedî buhatirîn mejî di nav
mirovan de
Şano pêşniyar dike ku vegerek ji kokê ve li dîtin û pîvanan peyda bibe ev
piransîbên mirovane tev li gel hemî rewîştên buha, û hemî ramanên Aştî û
hevaltiyê di navbera gelan de
Û ev yek gelek caran UNESCO pê bakiriye

Ev tişt hemî li paş perdê bi kar tèn ta ku ev pirinsîb û raman dibin ji hîma pêdiviyên kesên şanoger di serî de van ramanan bi cî tînin û paşê bi temaşevanan re parve dikan.

Ji ber vê yekê nûtirîn berhema me; bi vî navî hat “L,Arbre Diew” dubarekirina qewêtiyên Kindack⁷ Ngo Bi Kuban⁸, Mezinê me dibêje:

“Xweda wek dareke mezine”

Yê ku dikare ji hêlekêve di yek demê de ji qorzîkê ve binêre û kar bike: Herkesê di ser darê re bifire ewê tenê li pelan, fêkî û kulîlkên werzê salê binere.

Herkesên li bin xakê dijîn wê zanyariyên bihtir li ser qurmê wê li ba wan hebin.

Herkesê piştî xwe bi de darê wê bi hestên darê were pejrandin ji ber ew bi piştî wan hestiyar dibe.

Ew kesên ku ji her xaleke sereke tèn wê hin (deran bibînin) ku yên ne wekî wan, ne girînge wan tiştan bibînin kesin têgihîştî wê tiştên vaşartî di navbera qaşil û nava textê darê de nasbikin.

Hinên din jî û gelek zanyariyên pêwîst wê di nava qurmê darê de bin.

Lê çiqasî ev yek bê wate bê

Yan jî dûrnerîna her yekî ji wan jî hebin,

Tu kes hîç nikare cî dibin qurçikê de bigre û karibe bi van tiştan re bi hev re di yek demê de hest bike ku ne ew bixwe bibe ev dara Xwedayî.

Lê li paş vê yekê gelo em hîn mirovin?

Hemî Şanoyên cîhanê li hev dibanin û hev di pejrînin da baştirîn suxrê ji armanca cîhanî ya (ITI) re pêşkêş bike.

Li dawiyê û ji bo bîranîn a wê ya 70yî

Aştî li cîhanê pirtir heye

Li gel xurtbûna bi karanîna Şano...

Werewere Liking Gnipo. Hunermendê cûr be cûr.

7 kindack : “yara qewêtiyan” ev sernav bo Matriyarşizê, lêkirin; ew jina ku astek ji zanyariyê bi dest xistiye di riya Mbock yan Mbabo, ew rêxistina Olî li bajarê Bassa li nava Kamîron herweha gotina Mbombock tenê ji mêran re tê gotin.

8 Kuban : “Keça Biyong ê kurê Kuban e “ ev navê pîrka mine yek ji zanistên herî paşî “KI-Yi Mbock” ya ku ez jê fêrî erkê gihandinê bûm û eve 30 salin ku ez bi hêz li ser wê yekê kar dikim.

Werger ji Ingilîzî

Lawîn ŞêXO

Koma Şano/ Qamişlo